

**HELBEST**

**XEMCIVÎN**

---

**HETAV NE LEYLAN**

Çapa dîjîtal

Sîrwan Hecî Berko  
Malpera Amûdê  
2001

[www.amude.de](http://www.amude.de)  
[info@amude.de](mailto:info@amude.de)

Çapkirina vê pirtûkê bêyî destûra  
Xemcivîn û malpera Amûdê qedexe ye



# **TEMAŞEVAN**

**Her pertûk**

**dikare rengê te**

**biguhêze dil.**

**her awa ji nama te re**

**dibe cil.**

**û kula ala te**

**hêz li min hilgaft.**

**ez ne cadûbazim**

**bendên razên te ji hev vekim.**

**li minbihna demê fireh ne hat.**

**wek teyrokê zadê min da ber xwe,**

Pir min çand,  
çendî min çand,  
ne dîrok Ji cograffikê vebû ,  
ne qûç raserî cihê xwe dibûn .  
tu giş bûyî çar-pênc gepêن rewan,  
tu hatî cûtin.  
li ser masan raxistî ma û ma ,  
li ber  
stemê tu bûyî bênder.

**Mixabin!!**

te ji xwe ne pirsî ,  
çima ez bûme temâşevan ?

**28 -8-1998**

# **FIRINDÊ XEWNAN**

**Dixwazim,**

**di asmanê te de**

**bilind bifirim.**

**Piştî ko tu,**

**ewran di bin baskan de**

**bibînî.**

**Binase,**

**ez nema dikevim**

**ber nêçîra te.**

**4-1-1994**

# HETAVÊ

Li ser tîrêjên te,  
ez banga xwe dişnim.  
bi awirên te,  
ez nimêja xwe bi cî tînim.  
hetav e li ser dilê min,  
li ser canê min.  
kaniyên ko kenê te dîtin,  
gerek ne miçiqin!!  
ew destên ko destê te  
girtin.  
gerek li ser serê şêran  
ne veciniqin!!

evîna me di kulik de ye,

herdem hêvî di malzaroka

hêviyê de ye.

Hetavê,

dema em bi hev re bin

bê pîvane,

şev e yan roj e ?

bê pê û gav e...

pêvajoka evîna me,

bibihna pûngê dest pêkir,

di gulzaran de xwedî bû,

û xwe bi mehra filan girêda.!!

**Hetavê,**

**li ber deryê gazinan metalan**

**neke... ? !!**

**meger ji ezmanêbihriyan**

**rondik dibarin,**

**û herdem xunav li ser dêma**

**gulê dilûse.**

**bi şev û roj ,**

**em li bîra hev in**

**û ramanên me tucar**

**cotê xwe bernadin.**

**3-5-97**

# MOTIK

Heger ew tîp bi destê te bişkê,  
tê hezkirina xwe  
li ber bê berde!!  
tê çikçikana nama evînê,  
ji ser dehfê bifirîne.  
tê her û her dest li ber rû,  
mînak pepûkan bimîne!!  
bi hestê ciwan buhar dixemile,  
bi tava jînê, hêlîn dide ser kavil e .  
xema şikîna tîpê bi destê te,  
“erd” û ezman disincire.  
heger ez bêm bala te,

**tevna xwe ne ber de,**

**û rîsa hilman**

**dîsa bi rêsîne.**

**bela teşî bi destê te zivir neyê,**

**bela kenê te,**

**li girêkan nebirîne !!**

**bela lib bi lib xewn**

**bi dar vebin.**

**Bizane,**

**heger motik hebe**

**stêr bi şevê re**

**Qeys bi Leylê re dicivîne .**

**19-7-1997**

# **ÇÛNA TE !**

**1-çûna te ,**

**li kulîlkên dilê min**

**dibe terez .**

**wekû çawa qawanêن**

**dev li ken diçilmisin .**

**wisa evîna minî bejin çinar,**

**ji bilind paya xwe tête xwar .**

**agirê birûska xatir xwestinê,**

**gavan bi kontakê re ditevizîne.**

**û jîna min derbasî**

**şevêن spî dike.**

**roka bendewariyê bi gera**

li dora xwe , serê min gêj dike .

**2-Çaxê civînê dil bû**

şikefta “ Hera “

li bende Cibrîl

ev çend sal divê rewşê de ye.

bistiya razên min ,

ji ber peyv û çavneriyê

xwe dide alî ,

li gelek çal û çeperên

hêviyê xwe diveşart .

ta niha ci bayî

tevna pîrêpîrê ne biriye ,

ne jî hêlinâ kevokê

**ji peravêن awira min rabûye .!!**

**şûrê mixabin û poşmaniyê**

**di kalan de bêzare ,**

**tereza malik wêran**

**her û her bi ser kulfîkên**

**dilê min de dibare .!!**

**pêre keriyê gazinan**

**hate ser delavê lêvan ,**

**tinaz û bîranînên me**

**li kaş û newalên hilman**

**terqiyan .**

**ne ez li ber aramê lehengim.**

**ne tu karî**

**rojiya evîna min bigrî .**

**tev li tayêñ xweyî rojane ,**

**em bilind firiyan .**

**va buhar kulan ji dor**

**kenê perwanan dimale.**

**ez û te jî**

**mîna Qaz û Qulingan**

**wek du tilûrêñ rêwî**

**em bûne cotek**

**û**

**li hêlîna hingivîn vege riyan**

**14-11-1997**

# SERWERÊ

Diva min bi gota ,

giriyê te çem e ...

bi derde

jîn e ... yan dar e ...

xemkêse bi kesere ...!

diva min bi gota ,

nîsana te

ji salê dere ,

yan ji buharê

bi xeyd û xeme ...!

diva min bi dîta ,

ew stêra ji dilê te diçirisî ,

**û dibû gelawêja sibehan...!**

**diva min baş awazên**

**herdu çavan bibihîsta ,**

**yan li ber nalîna Zîna xwe**

**bi ketama ...!**

**diva min jî**

**çiya bi kola,**

**û pezkovî bikuşta ,**

**xunca ji ramûsanan bişkivî**

**av bida ...!**

**hela min ne got**

**û diva min bigota:**

**bawerke ,**

**bawerî bi te tenê ye ,**

**hîv û roj û yazde “kewkeb”**

**li ber te xûzbûn**

**ketin gumanan...!**

**6-4-1998**

# DÎL

**Her ko**

**ez berê xwe didim çavên te ,**

**vestîvalê tevzînokan**

**li hêza min destpê dike .!!**

**her ko**

**agirê laleşa te geş dikim ,**

**rewanê min dikeve perestinê .!!**

**her ko**

**ez hêtûna evîna te dibirim ,**

**baskên min dişewitin ,**

**û dilê min di çixêza te de**

**dîl dibe. !!**

# **TU DIZANÎ**

**Tu dizanî**

**çend hêtûn di dilê min de**

**Ji bo te dikeliyan.**

**çend hezar ahîn,**

**Ji hilma min difûriyan.**

**şev pêde, bala min**

**kedî ne dibû, ne dihat zeftê,**

**diçû sînorê hîvê diderand.**

**yan di nav xewnan de**

**li ser tenahiya xwe digiriya.**

**wêneyê te fire .. fire...**

Pê û gav qadeke bê sînor

daye ber çavê min.

ne dijwariyê,

ne pêrgîbûne,

ne pergendebûne,

çog na livin,

awir bi rewanê te vebûne.

ziman ji şayikbûna pêjna te

nagere.

çarik ji ser çavê pirsê çû

û volqana har ji dilê min

teqiya û teqiya !!

**6-3-1997**

# **DIBÊJIN**

**Çi dibêjin**

**mûyek ji porê wê ji xwe re  
kiriye gustîlk !!?**

**çî dibêjin**

**navê wê xistiyê berbejnekê**

**û bi xwe vekiriye !!?**

**bera bêjin , bera bêjin.**

**tembûra dilê min,**

**Ji van awazan pêve na xwîne !!**

**çavê min ji bejna te pêve  
roniyê na bîne !!**

**wêneyê dergûşa hezkirina me ,**

ji ser riwê kaniyê tîrêjan dide.

her çavî dike tora rokê,

her kesî bi xwe re di kenîne,

û evînê jî dilê kevran divejîne !!

dibe ko pirsîn çê bibe.

tu kî yî ? ez kî me ?

em kî ne ?

bera bêjin ci bêjin !!

“ez û te “

em yek best e û meqam in

bihna hemû gulan,

li ser lêvên buharê

em dixwînin.

7-3-1997

# LI GULISTANÊ

Li gulistanê ,  
li ber siya darê,  
li nêv hevrîşma ji dilan derdihat,  
can û keser û nimêj  
li yek torê ketin dîliyê.  
dil ji danê ne rawestiyan,  
kursî ji hembêza masê ne liviyan.  
bi Laleş me sofitî dît,  
em gihan eşqa Cezîrî  
em gihan bin baskên yezdanan,  
me şev û xewn bi hev re perest.  
ahînêن me, bi pêjnan ketin pêxîla hev,

û çavan bi sedê pertûkan  
di bîbîkên hev de xwendin.  
  
heya peyv û xêz û perparê  
rewrewkê tev li hev bûn.  
  
rewanêne me, wek du burcêne  
roniyê bilind bûn,  
  
pinpinîkan li ber şahî dikirin.  
  
esmanê gulistanê,  
  
werê dev li ken bi dîtina  
( Mem û Zînê ) şa dibû .  
  
pelên daran siya xwe dimijandin,  
ûbihna jînê ji hinavê xwe didan .  
  
kavkulîlkên pistepista me,

**riwê evînê diqelaştin.**

**bi xêr hatin , her tiştî li me dinerî**

**bi me re dikeniya .**

**bi her hawî, li her alî ,**

**xunava hestêن me bariya**

**li gulistanê,**

**li ser lêvên sosinan**

**tîpêن hêviya me meyan.**

**bi şahiya me re**

**nêrgiz , nesrîn û yasemînan**

**mehra dilêن me birîn ,**

**û tevaya gulan gotin:**

**ev e mizgîn .**

**9-7-1997**

# PALEVANÊ PEYVA ME ..

Peyv seridîne ,

ez jî palevanekî jêhatî me,

dasê bê qeynax navêjim sinbilan.

peyv seridîne ,

ez jî palevanê peyvame,

qalûça xwe navêjim heyvê !!

erê ez çêliyê çiya me,

lê deştê serê min hogirî xwe kir.

min gelek peyv ber das kirine

hîn jî ezê gelekan bavêjim ser komê.

Li vir û li wir bidim hev,

heya ez dasîtana azadiyê binivîsînim ,

wê çaxê zanibin ,  
ezê xwêdana xwe  
bi helalî paqij bikim.

**4 -1-1996**

# **LEYLANÊ**

**Min tu di dît , aveke zelal .**

**min digot: kengî ez bighêm te**

**ezê devê xwe têxim ,**

**kaniya dilê te ,**

**ezê tihna xwe bişkînim.**

**ez gelekî beziyam ,**

**lingên min**

**ji kaş û newalan ,**

**ji kêstek û striyan qelişîne.**

**li ber bayê har ,**

**baskên min qerimîn e .**

**Leylanê ,**

di derya te de ,  
ez wek laşekî bê ser û ber  
bi avê re çûm .

wek hingê ji kewara xwe  
bi xar çûm .

çendî caran ez giham hingiv  
û min hingiv da ,

lê ne neysekir ma  
ez bimijim .

û ne gulzarên te,  
li nêv gulan bê paseport  
ez hewandim .

5-9-1997

# BÊCIRÎ

Gelek pirs ,  
di xweziyê de  
kêferatê dikin .!!  
zimanê min ,  
ne pûçe ,  
lê awirên te  
bê cirin .!!

14-4-1994

# PÊÇANDIN

Herdu awir ,  
di pêrgîbûna çirisandina  
stêran de ,  
tirs ,  
û sînor ,  
û müşextbûn,  
di kewara şahiyê de ,  
pêçan ... !!

18-3-1994

# **EVÎNA TE**

**Evîna te ,**

**li kela damarêن min**

**strana xwe dipêje.**

**lewra dilê min**

**kêlîkekê tenê ,**

**ji dîlanê xayiz**

**nabe .!!**

**4 -2-1994**

# **PIPIL**

**Pilpila cîhana bêzariya min ,  
xewnêñ kewê dîl,  
li ser zinarê hêviyê ,  
dixwîne ... !!**

**31 -12-1993**

# GAVA TU ÇÛ

Gava tu çû ?

te ev agir vêexist.

pencên rokê ,

ji ser holka dil te rakir.

min bîrek li gora tîbîna xwe kola,

ez daketim û daketim ,

agir di hindirê min de dilîze ,

û av tihna min sar nake.!!

gava tu çû ?

nû li gunehan haybûm.

nû min guh da lîska êgir ,

hunerek di dilê min de çêkir.

**ji xwîna min ,**  
**çavêن xwe sor dike !!**  
**ne hişt ez kela hêşran bimijim .!!**  
**tu çû û hundirê min vêket,**  
**tu çû û dilê min ji**  
**qanê ket.**  
**awir li benda vegera te,**  
**li hev siwar bûn ,**  
**bilind bûn ... bilind bûn ...**  
**li nêzîk asmanan**  
**naskirin**  
**rivîna êgir tu hêz nadî ser.**

**7-3-1997**

**SÊKUÇ**

**Pênûsa min,**

**li ser sêkuça dil ,**

**du hêsran dikelîne.!!**

**gava**

**navê min dide**

**û**

**navê te distîne.!!**

**15-121993**

# **RAZÊ EVÎNA TE**

**Du roj çûn ,**

**du meh çûn,**

**du sal çûn ,**

**temen hin bi hin diçe..**

**hişê min hergav ,**

**pelê bîranînên te**

**wek kayina xezalan**

**dicû .. dicû ...**

**buhar e ,**

**ez**

**nerîna kewêن dilê**

**te dikim**

**adar e ,**

**ez**

**şevîna arê newroza te**

**dikim.**

**û razê evîna te,**

**hergav**

**pêñûsê li dilê min**

**disû .. disû ..!!**

**5 -4-1998**

# **PIRS**

**Diramînim ,**

**çima helbest nayê ?**

**çima dîlana min**

**bi awazêñ were nayê ?**

**şahî bi rijandina xwînê re**

**der nayê ?**

**hawar**

**ji ber wêrekiya fîşeka te,**

**li newalêñ ker daqûl nayê .!!**

**dipirsim û pirs gwîzan e**

**qeşema dilê te ,**

**bi kujtina kenê min dihile ?**

**meger kenê min çû,**

**û kenê te sêwî ma !?**

**meger Qeregêtaran**

**li çalê çandî ma !?**

**meger nalîna Memo**

**li zindanê girtî ma !?**

**tu olan mandel nekiriye ,**

**du cêwî**

**di malzarokekê de bijîn.!!**

**tu çiyan bê dilî ne kiriye ,**

**kulîlk bi du xwînan**

**bêtin vejîn.**

**ez û te ji yek zikîn e,**

**heger dilê merov hebe  
û bela ev ji min derew be  
( du zebeş bi destekî têtin rahiştin )  
û heger  
( du serî ne mezin bin  
di beroşekê de têñ kelandin )**

**1 -9-1997**

# **QERAR Û CEWAB**

**Ezê dîsa agir  
bi çira te ve deynim.  
ezê cama bêdengiya te  
biderizînim.  
ezê karibim gerdena xwe  
bikim pencere ,  
zimanê xwe  
ji te re bikim rê.  
dilê ta girtî ,  
Ji perwanêن peyvêن te re  
bikim gulzar .  
ezê xwe û te bikim takî**

**Li hev badayî ,  
bi dûv derziya zimanê  
hozanvanan vekim .**

**belê ... belê ...  
ezê karibim ,  
nêza evîndar û bendewaran ,  
bi çîroka me bişkînim.  
ezê çavêن te bi peyivînim .**

**dasîtanêن evînê ,  
bi wana vejînim .**

**belê pir kêf xweşbûm ,  
Pinpinîka dilê min  
buhara çavêن te bijart .**

**ferhenga pîroz vekir ,  
helbest û pexşanêñ min  
dane ser ziman...  
  
li ser pêlêñ deryake awazan ,  
tev de ew bûn qerar ,  
û ji buhara çavêñ te ,  
hoy evîndarê min ,  
standin bersiv û cewab.**

**1-11-1997**

# **KORBÛN**

Du nesrînan ,  
li du ciyêن cuda ,  
bi dûrbîneke kor  
nexşê buharê xêz kirin !!  
çav ,  
ji meşk û sêpiyê girtin ,  
û leymış kilan !!

**1994**

# **HELBESTÊ ..**

**Bi sedê caran**

**min gotiye te ,**

**heger**

**mêvana min**

**rûniştibe !!**

**bê zengil**

**derbas nebe !!**

**2-11-1993**

## XEWNA ME

Li ber pûtê pîroz

stû xwarim.

te jî dîlok bi çipka hêsrê re

ji min re distirand.

ma çi ji wilo pêve ?

ma çi ji perestinê wirde ?

hema ez û te û bihn û ba

û jîn

berdewame ... berdewame.

hema şitlên nêrgizan,

tu di dilê min de diçînî û diçînî

hema çîçekêñ buharê ,

ji evîna min û xwe re  
tu divejînî ... divejînî.  
hema ji biryar û peymanê  
ronî û kifşe,  
xewna me ji landika şevê  
bi firê ket.  
xwe hilda ... xwe hilda ...  
bi xweşya ramûsanê re  
bi rêket û bi rêket.

**14-4-1997**

## **SER ÇAVAN**

Nîrê te , li ser stiwê min e,  
**ha ... ha ... ser çavan !!**

hevsarê min , di destê te deye,  
**ha ... ha ... ser çavan !!**

navê min di binya navê te reye ,  
**ha ... ha ... ser çavan !!**

lingê te , li ser  
tiliya nivîsandinê ye,  
**ay ... ay ... ser çavan !!**

**4-11-1993**

# **ANAHÎTA**

**Bişkojeke spehî,  
li ser şaxê  
bi rewşen û ronî  
gelo !!?  
hêza evîna min  
bi awira wê  
bête girêdan ...  
ezê karibim  
têhna bişirandina wê  
bi pîvîm ?**

**31-1-1995**

# **DİZÎ**

**Çinvina xweziyan,**

**sawîrê buharekê**

**di mêtjû yê min de**

**dihûne .**

**li pişt perdê**

**pirs bi yezdanan re mijûlin .!**

**xama min jî**

**Ji salixdanê derket ,**

**piştî fermêsk**

**ji ferhenga jînê dizîn .**

**31-1-1995**

## **PEYAMA MIN**

**Bîranînêñ te ,**

**bûne ewr,**

**xwe li kohê çiyayê min girtine.**

**bîranînêñ te,**

**tavêñ buharê ne,**

**di hilma min de derd û kul harkirine.**

**ramanêñ min bûne deşt,**

**lehî û firtonan,**

**ew dar û gul û fêkî,**

**wek leymiştê**

**li ber xwe birine.**

**min digot:**

**ez mûmekim**

**di birîna te de vêketî me !!**

**min digot :**

**ez nexşekêşê**

**dîroka te me !!**

**ji bo wê**

**hişk û ter**

**laşê min bûye mûmdan.**

**gava te xwest ,**

**di ser serê te re,**

**ez bum refekî murxan.**

**gava te got:**

ji ser lêv û zimanê te,

ayet bi ayet

di jîna tekoşînê de,

ez bûm pehlewan.

peyvin şayik,

hevokin ciwan,

babetin mezin,

ez bûm kilît

bi min girtîgeh vebûn.

ez bûm rengin zelal,

bi min armancên te xuyabûn.

ez bûm dîkê sibehan,

banga bû şores ,

**bû ferman ,**

**xêr nake xew !!**

**rabin ... rabin ,**

**li cîhanê min topa**

**azadiya te teqand.**

**ez bûm dildar,**

**ez bûm memo,**

**ez bûm Ehmedê xanî**

**miftiyê civîn û civandinê**

**bi noşî yan ne noşî,**

**her tê bixwî,**

**ji dew**

**nîvişkê ( nûbuhar ).**

**ji bo biçûk û mezinan**

**ji bo kurdan ...**

**raweste ... biramîne...**

**ji bo yekîtiyê ... hevgirtinê ...**

**dasê navêje**

**zadê sînordaşan.**

**qûça pir nekin ... cihê nebin ..**

**ez bûm genim,**

**peyama min**

**giha yezdan ,**

**ez kurdim ...**

**ez kurdim...!!**

**24-8-1998**

## XWEZIYA MEST

Pêñusa min ,  
li doza nerîna te  
lêvên xwe dileqîne.  
dizane germa hezkirinê  
ji sînga te difûre ...  
xayizbûna bîbîkêñ çavêñ te ,  
hêrzan dide dilê min .  
ez nikarim salxê , xweziya mest  
ji te re wergerînim ,  
tenê karim bêjim  
keriyêñ ramanêñ şerpezekirî  
li ber wana ez bûme şivan .

?

**pirsek bê kilît**

**li ber deriyê şermê**

**matmayî ma .**

**hêviyek bê çare dît ,**

**şev pêde li heyvê dinerî ,**

**sibehîn !!**

**xatir ji çavêن te xwest ,**

**kodek tembûrê**

**û çend mijgûlên bi hêşir**

**bersiva xwe**

**ji wana stand ..!**

**18-8-1995**

# **ARAM Ü SAMAN**

**Li ber peravêن derya te...**

**dimeşim , sergeştim .**

**bê kelek û gemî me ,**

**ne jî avjeniyê dizanim !!**

**çend ayet min xwendin ,**

**tu kes bi hawara min ve nehat .**

**min berê xwe da rokê ,**

**di cihê xwe de zîzbûye**

**û rawestiyaye !!**

**tîrojên wê**

**bi ser holka dilê min de dikevin,**

**û bi siya min re dikenin .**

**dizanim derya te kûre ,**

**dizanim avjenî lê ne hê sane ...**

**beramber jî diramînim ,**

**aram û samana**

**bi evîna te re bikêsim ,**

**heger li ser dirêjiya**

**temen be jî**

**ne girane!!**

**ne girane!!**

**1-9-1992**

# **DAWÎ NE HAT**

**Di wê demê de ..**

**di vê deme de ..**

**di tariyê de , di roniyê de ..**

**dixwestin te veşêrin ,**

**ziman û çavên te girêdin ,**

**dilê te biguvêşin .**

**çend xêz û rêz danîn**

**gotin ... peyivîn ,**

**û dawî ne hat !!**

**di gel hev ,**

**li ser te çûn û hatin,**

**durî vebistin ,**  
**xwîna te mêtin ,**  
**qeymax firotin ,**  
**êrîş kirin ,**  
**te perçe-perçe kirin .**  
**te mijtin , te biriştin**  
**ji xêr û bêra te şûştin ,**  
**û dawî ne hat .!!**  
**di binê zindanan de**  
**birçî û tazî te hiştin ,**  
**li bin dar û dolab û lêdanan**  
**neynûk û por hilkirin ,**  
**çi xwestin kirin ,**

**çi xwestin birin ,**

**tenê ramana te...**

**tenê ramana te...**

**nikarîbûn û nikarin**

**ji serê te bibin**

**lewra**

**dawî ne hat.!!**

**1992**

# SIBA TE XWEŞ BE

Siba te xweş be

ji tariyê tu rizgar bûyî .

bi rengekî nû ,

bi dilekî geş ,

pêre hate bîra min

baxçeyê gulan ,

buhara dilan ...

siba te xweş be ,

gula spî

ji spîda berbangê ,

bi nazî

te cam û xweşî û evînî

**li hev civandin ...**

**siba te xweş be**

**bi vê hatinê ,**

**keskesorek rengê taca kisra**

**li serê sîpêñ te gerand ...**

**siba te xweş be**

**bi awazêñ şalûl û bilbilan re,**

**bi ahengin zelal,**

**li ser lêvêñ tenik**

**bi dengê keman û nayê re,**

**vê gavê**

**perda guhê min hejand ...**

**siba te xweş be**

mûm û şemala sersalê ,  
perperîk û perwanê ,  
gotin û helbest û dîwan ,  
ji dil û hiş û hinavê min,  
li ser rûpelan  
te weşand ...  
siba te xweş be  
bi bayê hênik re  
ko porê zer û zêr  
wek pêlên derya  
mû bi mû  
li hev wergerand .  
**6-10-1990**

# **KENGÎ ?**

**Kengî**

**baxçevan rehêن leman dibire ?**

**kengî**

**tilûr hêlîna xwe xirab dike**

**û difire ?**

**kengî**

**evîna Memo û Zînê**

**bi hezar Beko ewanî dimre ?**

**û kengî**

**darê ala gelê min dişkê**

**û ew lê dinere ?**

**13-4-1995**

# SÎWAN

Gava tu ket ,  
sîwana minî mijmijok ...  
te şerma xwe kiras kir ,  
te pencêن xwe lê kirin gulok ...  
hoy dilê şiyar  
ji zû de tu li dor vê ketinê  
diçû û dihat .!!  
hoy dilê evîndar  
kula li ser  
wan gotinan hat bijartin,  
çawa hat cûtin ?  
çawa hat xwarin ?

**tu ji zû de  
li dor xefkê diliviya,  
û libok bi sed rengî te  
diramûsand .!!  
tê bîra te carekê tenê,  
nikilê te  
bê tirs û saw  
li defa sînga min da .!!  
tê bîra te  
ew kernevalê tevzînokan  
di herdu laşan de,  
vêket geriya û bi rêket ...  
ez dizanim tê bîra te,**

**tiqtıqa kenêñ me , ko serxewş**

**ji du kewarêñ hingivîn**

**bi firê ket.!!**

**ma ne bes wilo jî,**

**ew tiliyêñ**

**ko bi çi hawî ji hev ne dibûn,**

**cotbûna me**

**di awazêñ damaran de jîn dikirin.!!**

**hîn jî ezê bêjim,**

**gava beybûn**

**li serbihna buhara me**

**geş dibû .**

**gava wênevan**

ji nexşandina cîhana me

bêzar dibûn .

çîroka me xweşbû û xweşe

ji mêt de, ta niha,

û heyâ û heyâ ...

evîna berdewam

ji çaxê zayînê ,

li her çaxê heyînê,

çirûskên bê bend

ji pertûkên pîroz

ji her nameyêñ pêximberan

der kirin.

ma tiştek nema ez bêjim ?

**asîman herdem bi me re dikene,**

**û buhar rengê xwe geş dike.**

**fermo**

**bi destê xwe agirê**

**zerdoşt vede,**

**mûmdanê dîsa bigrîn .**

**piştî baskên te**

**li sîwana min serbestbûn**

**em bûn cotek perperîk**

**li cîhaneke ronî**

**firiyan û firiyan**

**30-3-1997**

# **REWŞA TE**

**Şekirê li ser lêvan**

**ez xistime torê .**

**hîn mizgînî belav ne bibû ,**

**bû guvguva hingan li dorê .**

**ne ko te**

**nivişta şevê bi xwe vekiribû**

**xwena te ya yekane**

**bibû du parce ...**

**herdu dêmên teyî geş ,**

**bi du ramûsanan**

**berê xwe ji hev guhertibûn .**

**reş û sorê girêdana serê te ,**

**bibû du nîşanêñ cuda .!!**

**zer û keskêñ yar**

**başqe .. başqe .. gora hev vedan !!**

**ramûsan di gezkirinê de rawestiya .. !!**

**û herdu diranêñ bi qul**

**jehra xwe gihadin dil !!**

**di derya hêşir xwîn û xwêdanê de ,**

**tu bûyî gemiya bihn çikyayî !!**

**kevokêñ te bi ku de firiyan ,**

**bê bersiv vege riyan .**

**kom û hêzêñ te pir li paş man**

**bi vê ezezîtiyê kes ji wan**

**naçe dam .!!**

**29-8-1998**

Heval Xemcvin  
 mi şihre te xwend.  
 hējane nûne,  
 gelek dîlê min şad bû.  
 ȳibinim karwana şihra  
 Xani û Cegerxwin û Qedrican,  
 hêj pêşve diçê û nasekine.  
 em dibêjin :  
 destê te xweş be .



(Ezedin mustefa resîl )

Qamişli

27/1/1994

**Ezîz Xemcivîn**

**هە قال ھەمم بیقىنە**

۱ تىچىرىتى نە ھۇئىنىد، ئەپىر(نە)  
 خۇوە، كەنەن دەنەن ساد  
 بىد د بىيىنە كار واناسىۋىد  
 ئاھىد جەڭىز ھۇئىنە د قەدرىدىغان  
 ئەپىتىقە دۇھ دىنە كەنەن  
 نەم د بىرچىتى  
 دادە سىنى توھۇنىت بىلى

*خەيزىز خەمم*

ئەپىتىقە سەخا و سەدەن  
 ١٩٩٤ / ١١ / ٢٧